rupel 1+.qxp_Layout 1 4.02.2022 18:54 Page 1



## Tawisê Melek, Lîlîth û Ademê nezan

Her çiqas baweriya êzidiyatiyê, qewl û rîtuelên wê ne bi nivîskî, lê bi awayekî devkî û bi awayên cuda gihiştibe roja me ya îro û gelek agahiyên derbarê ola êzidiyatiyê di nav xwe de nakokiyan bihewînin û li ser.. ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Mora heftem ya Bergman

Bergman di kitêba xwe “Images” de hunerê bi şêweyekî seyr û ecêb pênase dike: “Huner serbest e, bê şerm û bê berpirsyarî ye. Ew tevger û bizaveke întensîf û tîr e, bêhedan e dişibe kirasê marekî mişt gêrik, mar bixwe ji zû de miriye... ***Ciwan Kado / R.11***



## Ji Lozanê heta îro êrîş didomin

Şeva 1’ê sibatê balafirên şer ên dewleta tirk a dagirker bi awayekî hemwext, êrîşî Wargeha Penaberan a Mexmûr, Şengal û rojavayê Kurdistanê kirin. Bombebarana li Şengalê bi saetan berdewam kir û 21 dever hatin bombe kirin... ***Felemez Ulug / R.6***


# xwebûn

7 - 13 SIBAT 2022 HEJMAR: 112 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Serhildêr her serbilind in

Balafirên şer di serê sibatê de Mexmûr, Şengal û gundên Dêrikê bombe kir. Di êrîşan de 9 welatî hatin qetilkirin. Bi hezaran gelê Mexmûr, Şengal û Rojava li dijî êrîşan daketin qadan û êrîş bi tundî şermezar kirin. Teyrê Tawis ku di êrîşên balafirên şer ên tirk de hat kuştin û serî netewandibû bû sembola serbilindiyê

Balafirên şer ên Tirkiyeyê di şeva 1’ê sibatê de bi awayekî hemwext Mexmûr, Şengal û Dêrik bombe kir. Li dijî êrîşan li Mexmûr, Şengal û bajarên Rojava gel derket kolanan û êrîş şermezar kirin. Hevseroka Meclisa Gel a Mexmûrê Filîz Budak têkildarî êrîşên balafirên şer ên Tirkiyeyê anî ziman ku di 1’ê sibatê de bi destpêkirina meha sibatê û salvegera komployê de êrîş pêk hat û wiha got: “Dema çalakiyên şermezarkirina tecrîdê û çalakiyên li dijî komployê zêde dibin û dikevin rojevê, êrîş jî zêde dibin. Vê civakê teslîmiyet û serîtewandina li dijî dewletê qebûl nekir. Ji ber zilm û zorê terka welatê xwe kirin û hatin li başûrê Kurdistanê bi cih bûn.Li gel hemû zor û zahmetiyan li ber xwe didin. Li dijî êrîşên DAIŞ’ê dîsa li ber xwe da. Li 8 wargehan bi cih bûn. Lê ji 8 wargehan hatin koçberkirin. Êrîş li dijî hafizaya berxwedana salên 990’î ye. Êrîş li dijî hafizeya gelê kurd a têkoşer e... ***R.6***



## Planên nû yên navdewletî

DAIŞ ya ku ji hêla hêzên hegemon ve hat avakirin bû belaya serê gelên Rojhilata Navîn. Ev bela bi berxwedana YPJ û YPG’ê ya ku pêşengiya wê jinên azad dikirin rê li ber girtin. Ne tenê çeteyên DAIŞ’ê wenda kirin, herî zêde xwediyê wan wenda kirin. Ev jî xwediyê wan dîn û har dike. Ji ber vê yekê dema ku çeteyên DAIŞ’ê û xwediyê wan êrîşî gelê kurd dikin, hêzên navneteweyî bêdeng dimînin. Herî dawî çeteyên DAIŞ’ê bi piştgiriya hêzên hegemon û dewletên derdorê bi hêzeke mezin êrîşî Hesekê Wexta mirov li dema vê êrîşê dinêre dibîne ku bê êrîşeke çawa bi plankirî ye û armanca... ***Zana Welat / R.7***



# Hegemon hevkarên DAIŞ’ê ne

Sala 2014’an bi êrîşa li ser Mûsilê navê DAIŞ û çeteyên wê ji aliyê hêzên navdewletî ve hat belavkirin. Ji wê rojê ve çeteyên DAIŞ’ê bûne bela serê Rojhilata Navîn. Ev çeteyên pişta xwe dane hêzên navdewletî û bi taybetî Tirkiye, her ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têk diçin, planên tirkan serobino dibin û ji ber vê yekê her carê bi rengekî cudatir êrîşî herêmên demokratîk dikin. Ev 12 sal in Tirkiye bi piştgiriya dewletên hegemon bênavber êrîşan dibe ser gelê kurd. Ji bo destkeftiyên wan tune bike çi ji destê wê tê dike. Dewleta tirk bi piştgiriya Rûsya û DYA’yê Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî dagir kir û li van herêman fêl û finazên ji bo herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi çeteyên DAIŞ, OSO re dike... ***R.7***

KEWÊ REDKAN

## Bayê Bezê

***R.10***

## Polîtîkaya kurdkî ya Bolşevîkan

Key ke Rûsya de serra 1917î de şorişê bolşevîkan ame ca, îdareyê Moskowa heqê çarenuştişê xo da kêmneteweyanê etnîkîyan. Nê kontekstî de bolşevîkan 2ê Teşrînê Peyênê 1917î de ju deklarasyon îlan kerdîbî. Kurdanê Rûsya kî sey nasnameyê etnîkî nê heqî girewtîbî. Şorişî ra dima mîyanê bolşevîkan û şorişgêranê hemberan de Cengê Sîvîlê Rûsya (1918-1922) bî. Wextê nê cengî de komara Tirkîya kî ronîyaybî. Bolşevîkan kemalîstanê ke Anatolîya de verba îngîlîzan û fransizan “tekoşîn” kerdêne, hetkarîya leşkerî û madî dayîbî. Çike înan waştêne ke averşî... ***Dr. Îsmet Konak / R.9***

## Amûra bişaftinê

Zarokên kurd bi salan in di bin şûrê dagirkeriyê de ne, di serî de perwerdehî, bi bişaftinê re rû bi rû man û dimînin. Tişta ku bi salan dan zarokên kurdan ne tenê matematîk û dersa erdnigariyê ye, dema mijar kurd û zarokên kurdan be, keft û levta wan du-sê qat zêdetir dibe. Dewlet dibêje bi qasî ku ez rê didim te fêr bibe û bi qasî ku tu bi kêrî min bêyî fêr... ***Şîndar Akinci / R.8***

## Dîroka perwerdehiyê



Dîroka mirovahiyê dîroka şaristaniyê ye. Mirovahiya ku şaristanî pêk aniye, bi naskirina gerstêrka/dinyaya ku li ser dijî û xwezaya ku jê sûd wergirtiye qayîl nebûye, her wiha ji bo guherandina xwezayê û dinyaya ku lê dijî, ketiye nav lêgerîn û lêpirsînên kûr û dûr û bêdawî. Bi wê jî nehatiye ser; di kûrahiya asîman de li qonax û wargehên ku li ser bi cih bibe, geriyaye û gelek tiştên nû fêr... ***Adar Jiyan / R.5***

## Mîzaha kurdî

Mîzah weke cureyeke hunerê di wêjeyê de cih digire. Di her civakê de mirovên ku bi vî karî re mijûl dibin hene û civaka xwe bi vê hunera xwe didin kenandin. Weke her civakê di civaka kurd de jî qerf û henek hene û di her serdemê de bi rêbazên cuda karê mîzahê hatiye kirin. Resûl Bafeyî platformên medya dijîtal bi awayekî baş xistiye xizmeta mîzaha kurdî û dîmenên... ***Hevpeyvîna Kadrî Esen / R.4***

## Çi ye ev ‘nasname’?

Ez ê di vê nivîsê de berê xwe bidim têgiheke din a ku di vê serdemê de xwedî girîngiyeke pir mezin e. Her çiqas weke gelek têgihên din têgiha ‘nasname’yê xwedî dîrokeke kevin be jî bi avakirina pergala netew dewletan re girîngiya vê têgihê zêdetir bûye. Jixwe ev pergal li ser nasnameyan hatiye avakirin û bi heman awayî vê pergalê gelek nasnameyên nû jî bi xwe re aniye. Dema meriv behsa vê serdemê bike bêguman wê yekser netewdewlet bê bîra meriv lewra meriv dikare vê serdemê weke serdema nasnameyan jî bi nav bike. Lê dîroka... ***Hisên Çatikkaş / R.8***

# Kurdkî ganî biba ziwanê perwerdeyî

Sîstemê perwerdeyî yê Tirkîye de kurdkî sey dersêka weçinîte ca gêna. Serekê Egitim-Senî yê Colemêrgî Murat Balikesîrî derheqê babete de qisey kerd. Balikesîrî pare kerd ke ê raşt nêvînenê ke perwerdeyê bi ziwanê dayîke bi dersanê weçinîteyan bêro pêşkêşkerdene û vat ê wazenê kurdkî biba ziwanê perwerdeyî.

Balikesîrî îfade kerd ke sey sendîka înan mewzaurê xo de pare kerdo ke ê perwerdeyê bi ziwanê dayîke wazenê û vat: "Ma vanê heq o ke domanî bi ziwanê xo yê dayîke perwerde bivînê. No heqo ke peymananê mîyanneteweyîyan de esto, ganî bêro caardene û seba ney ma têkoşîn bikerê. Ganî perwerde bi ziwanê dayîke û demokratîk bo. Ma raşt nêvînenê ke perwerdeyê bi ziwanê dayîke bi dersanê weçinîteyan bêro pêşkêşkerdene. Dersê weçinîteyî seba afernayîşê hîsgerîye girîng ê la wayîrvejîyayîşê ziwanê xo zaf girîng o. Ma wazenê kurdkî biba ziwanê perwerdeyî.



Seba averşîyayîşê domananê ma, perwerdeyê ziwanî yê bi çend saetan merdiman rê nêvejîyeno. Seba zêdînayîş û averberdişê ney dersanê weçinîteyan de ganî dersê ziwanê dayîke bêrê weçînayene. Ganî keyeyî na babete de hîsger bibê ke têna dibistanan de nê keye de zî her ca de bi ziwanê dayîke domananê xo de qisey bikerê." *COLEMÊRG*

# Polîtîkaya kurdkî ya Bolşevîkan de rolê Tirkîya

Dr. Îsmet Konak



Key ke Rûsya de serra 1917î de şorişê bolşevîkan ame ca, îdareyê Moskowa heqê çarenuştişê xo da kêmneteweyanê etnîkîyan. Nê kontekstî de bolşevîkan 2ê Teşrînê Peyênê 1917î de ju deklarasyon îlan kerdîbî. Kurdanê Rûsya kî sey nasnameyê etnîkî nê heqî girewtîbî. Şorişî ra dima mîyanê bolşevîkan û şorişgêranê hemberan de Cengê Sîvîlê Rûsya (1918-1922) bî. Wextê nê cengî de komara Tirkîya kî ronîyaybî. Bolşevîkan kemalîstanê ke Anatolîya de verba îngîlîzan û fransizan "tekoşîn" kerdêne, hetkarîya leşkerî û madî dayîbî. Çike înan waştêne ke averşîyayîşê îngîlîzan û fransizan hegle bikerê. La têkilîya ke no wext virazîyaye seba kurdan qet bixeyr nêbîye.

Îdareyê Enqera hetêkê ra bolşevîkan ra paştî girewtêne, hetêkê bînî ra peyê kurdan de kay çerexnayêne. Aye zanayêne ke kurdî azadîye wazenê. Nê kontekstî de mabenê hukmatanê Moskowa û Enqera de 16ê Adarê 1921î de peymana Moskowa ameye îmze kerdene. Na peymane mabenê înan de sey peymana birayîye û embazîye say bîyêne. Goreyê bendê 8ê na peymane eke zerre de û teber de ju kes yan grûb înan rê gefî biwano her di îdareyî paştî nêdanê ci. No wext ma zanîme ke Qoçkirî de xoverdayîşêk ame ca. Hetê deryayê sîyaye ra Topal Osman kî seba pankerdişê xoverdayîşî şîbî Qoçkirî. Goreyê îdîayan çekê ke bi destê Topal Osmanî ameyîbî xebitnayene welatê Sovyetan ra bîyî.

No taw başûrê Kurdîstanî de Şêx Mehmûdê Berzincî sere wedarnayîbî. Serekê Juyîye Sovyetan Lenînî rê çend mektubî rusnaybî. La ey nê mektuban bêcewab vera dayîbî. Oncîna wextê xoverdayîşê Şêx Seîdî de bolşevîkan fikrê kemalîstan seveknayêne. Goreyê înan îngîlîzan no xoverdayîş organîze kerdîbî û tevgerê Şêx Seîdî senînîya feodalî antêne.

Îdareyê Moskowa û Enqera mabenê jubînan de serra 1925î de peymana bîne îmze kerde. Goreyê na peymane eke qewetêk herîşê înan ra ju bikero, ê bêhet manenê. Na peymane ra tepîya di hetan têkilîyê xo aver berdî. Serra 1927î de mabenê înan de peymana ticarîye îmze bîye. Sayeyê na peymane Juyîye Sovyetan 7 bajaranê (Îstembol, Îzmîr, Trabzon, Mêrsîn, Erzîrom, Qonya, Eskişehîr) Tirkîya de heqê akerdişê temsîlkarîya ticarî girewt xo dest. Bolşevîkan na peymane seba bazirganîya xo sey "pencera" ya ke hewa dana qebul kerdîbî. Çike berhemê ke ameyîbî viraştene sayeyê Tirkîya şîyêne welatanê Rojhelatê Mîyanî û Balqanan.

Goreyê fikrê mi peymana serra 1927î rijîyayîşê Kurdîstanê Surî lez kerd. Bitaybetî Tirkîya zaf israr kerdêne. Nê kontekstî de nameyê Mîr Cafer Bagîrovî yeno xebitnayene. O raver sey serekê îstîxbaratê Azerbaycanî wezîfedar bî. Serra 1933î ra tepîya sey sekreterê hemeyî yê Partîya Komunîstanê Azerbaycanî gurîyaybî. Goreyê tayê îdîayan lobîya ke Moskowa de bi destê Mîr Cafer Bagîrovî ame ca, rijîyayîşê otonomîya kurdanê Sovyetan ser o tesîr kerd.

Wedardişê Kurdîstanê Surî ra dima derheqê kurdanê JKSS de zordayîşê hukmatê Tirkîya zêdîya. Sey nimûne, serra 1935î de Wezîrê Karanê Zerreyan Şukru Qaya bi maslahatguzarê JKSS yê Enqera qisey kerd. Ûca de tayê heqê kurdan ê ke sey rojnameyê Rîya Teze û wendegehê ke mamoste resnenê rexne kerdî. Şukru Qayayî vato heqê ke îdareyê Moskowa dayê înan, tesîrê kurdanê ke sînorê Tirkîya de manenê kenê. Wezîrê Tirkîya nê têhetameyîşê xo de peymana ke raver îmze bîbî ardo rojeve. Goreyê fikrê Şukru Qayayî heqê ke kurdanê Sovyetan girewtî hemberê peymanan ameyêne.

Oncîna serra 1935î de dîplomatê Rûsya yê Armenîstanî E. Neymark raporêk rusneno Moskowa. Nê raporî de derheqê pêşnîyazanê di tirkan (konsolosê Lenînakanî Selahattîn Aral û dîplomat Yilmaz) de tayê malûmatan dano. Goreyê nê raporî dîplomato tirk Yilmaz (nameyê ey o derg nêzanîyeno) kî wendegehanê pedagojî rexne keno. Yilmaz vano ke nê wendegehan de zaf wendekarî mezûn benê. Ney ra teber estbîyayîşê rojnameyanê Rîya Teze û Sovyetskîy Kurdîstan (Советский Курдистан) sey dismenîye vîneno.

Çi heyf ke serranê 1937-1938î de Rîya Teze ame padayene, sinifê roşnvîran zordayîş dî û wendegehê ke ziwanê kirdaskî de ders dayêne oncîna ameyî padayene. Tayê kurdî Armenîstan û Azerbaycan ra nefî bîyî. Vatîşê Karl Marksî xo vîr ra mekerîme: "Şar o ke şaranê bînî pan keno azad nêbeno."

# Sebebê bextewarnêbîyayîşî: Meseleyê kurdan o

Dezgeyê Îstatîstîkî yê Tirkîya (TUÎK) dayeyanê xo yê 'Cigêrayîşê bextewarîye yê cuye' eşkera kerd. Goreyê dayeyanê cigêrayîşî Amed bajarê tewr nebextewar o. Cigêrayîş de se ra 24.75ê bajarî dîyar kerdo ke cuya bîyaye ra razî nîyî. Badê Amedî bajarê Dêrsim, Riha, Mêrdîn, Mûş, Bedlîs û Êlih yenê. Amedijî sebebê nebextewarîya xo wina ardî ziwan.

Welatîyan ra Cîhan Dogru da zanayene ke o bextewar nîyo û sebebê yewine ê bextewarnêbîyayîşî zî ekonomî yo û wina vat: "Ez verê cû bextewar bîya. Her çî baş bî. La nika merdim nêeşkeno bivejîyo kuçe. Sebebê nê çîyan krîzê ekonomî yo. Ê 'partîyê sîyasî yê ke benê îqtîdar' biwazî ma bextewar benê, nêwazî zî ma bextewar nêbenê. Meclîs de vanê ke meseleyê kurdî çinî yo. Meseleyê kurdîtî esto. Wexto ke merdim vejîyeno teberê Amedî merdim nijadperestî vîneno. Meseleyê kurd her ca de yo. Merdim nêeşkeno kurdî qisey bikero."



Muhammed Çavdarî qiseykerdişê xo de bale ant betalî ser o û wina vat: "Dewlete kêfa xo kena. Qeyûm her çî werd. Sebebê zêdebîyayîşê hûmara bextewarnêbîyayîşî meseleyê kurdî yo. Bi nijadperestî nizdîyê Amedsporî benê. Nêverdenê ê şêrî otel zî. Seba ke ê kurd î. Ez bextewar nîya. Ez Antalya de xebetîyena. Çimkî ez nêeşkena bajarê xo de bixebetîya. Tedayêka zêde bi ma kenê. Wexto ke ma vanê ma amedijî kar nêdanî ma."

Abdulkadîr Erdoganî dîyar kerd ke seba meseleyê Amedî çîyêk nîno kerdene û wina vat: "Eke biameyêne kerdene do qiymetê Amedî sey Stenbol, Anqara û Samsunî bibayêne. Kam gişta xo Amedî rê wedarno ma heqê xo înan rê helal nêkenê. Seba ke no zilm biqedîyo ganî şer peynî bibo."

Namih Şanli zî vat ke sebebê zêdebîyayîşê hûmara bextewarnêbîyayîşî çinîbîyayîşê yewîya kurdan o û vat: "Eke ma bibî yew, ma do bieşkî bi hawayêko aram pîya bicuwîyî."

Welatîyan ra tewr peynî Hasan Esenî qisey kerd û o zî wina vat: "Sebebê bextewarnêbîyayîşê şarê herême meseleyê sîyasî, ekonomî û kulturî yo. Herême de her tewir zilm û teda esta. Herême de bêedaletî, feqîrî, bêhuqûqî û hema her çî esto. Heta ke teda û kedwerdişê serê kurdan dewam bikero, bextewarî mumkun nîyo." *AMED*

# Dadîyanê Plaza de Mayo mesajê paştdayîşî dayî şarê kurdî




Dadîyanê Plaza De Mayo wextê dîktaya Arjantînî de seba domananê ke hetê dewlete ra ameyêne remnayene û kiştene ameybî pêser û Mayanê Şemeyî rê îlham dabi. Endamanê ronayoxan ê Dadîyanê Plaza de Mayo ra Norita Cortinas û Mirtase Baravelle hêrişê peyênan ê dewleta tirke yê vera Kurdîstanî şermezar kerdî. Dadîyanê Plaza de Mayo qiseykerdişê xo yê paştdayîşê şarê kurdî de vatî ke seba ke ê veng û çalakîyanê şermezarkerdişî bizêdînê do xîret bikerê.

Dadîyan vat ke hêrişê vera Rojawan, Şingal û Mexmûrî nênê qebulkerdene û nê hêrişî rîyê faşîstî yê dewleta tirke nîşan danê. Dadîyan îfade kerd ke ê do hetê têkoşînê meşrûyî yê kurdan de yê.

Dadîyanê Plaza de Mayo vat ke seba ke ê veng û çalakîyanê şermezarkerdişî bizêdînê do xîret bikerê. Dadîyan vat: "Ma verar şinê cinîyan ê çêran ê Kurdîstanî. Faşîzmî rê bes o!" *BUENES AIRES*